Freie Demokraten FDP

# Li Ewropayê tê nîqaşkirin

## Ewropiyên hêja,

nirxên bingehîn ên Yekîtiya Ewropayê - demokrasî, serweriya qanûn û mafên mirovan - bingeha civaka me ne. Vana dewlemendî û ewlehî di aştiyê de ji me re garantî dikin. Bazara navxweyî ya hevpar, rêwîtiya bê sînor û cihêrengiya çandî ji bo me bûye mijarek bê guman. Lê civaka me ya aborî û aşitiyê ya lîberal ji ber hewldanên bêîstiqrariyê yên hêzên tundrew yên ji hundir û êrîşên dewletên otokratîk yên ji derve bi awayekî girseyî tê tehdîtkirin. Lewma divê em ji her demê bêtir nirxên xwe bi biryarî biparêzin. Em Demokratên Azad amade ne. Erkê me parastina azadî û dewlemendiya ji bo nifşên pêşerojê ye. Em aborî, ewlehî û serxwebûna Ewropayê xurt dikin, ji ber ku Ewropa pêşeroja me ye.

Dilsoza we

Marie-Agnes
Strack-Zimmermann



## Şer li dijî cinawirên burokrasiyê.

Li Almanyayê burokrasiya nû her tim zextê li mirov û şîrketan dike. Gelek ji van qaîdeyan ji Ewropayê tên û Seroka Komîsyonê Ursula von der Leyen (CDU) ji wan berpirsiyar e. Em dixwazin burokrasiyê bi awayekî radîkal sinordar bikin: Ji bo her qaîdeyek nû ya Brukselê, divê du qaîdeyên kevin werin jêbirin. Ji ber ku sinordarkirina burokrasiyê mezinbûnê bi xwe re tîne û tu mesref lê naçe.

## Rêveberiya ku bi Îngilîzî jî diaxive.

Divê pêwendîkirin bi rayedaran re ji bo her kesê li Ewropayê hêsantir bibe. Ji ber vê yekê em dixwazin pêwendîkirin bi rayedarên hemî welatên Yekîtiya Ewropyayê re bi zimanê Înglizî gengaz bikin. Ev dê jiyana welatiyan û karsazan hêsantir bike.

## Dewlemendî bi rêya bazirganiya bêtir azad.

Em dixwazin dewlemendiya xwe biparêzin. Divê xûrek erzan bimîne û aboriya me ji nû ve mezin bibe. Ji bo vê jî em dixwazin bazirganiya bi welatên din re xurtir bikin. Armanca me qadeke bazirganiya azad ya cîhanê ya demokrasiyan e.



# Bêtir karkerên şareza ji bo aboriya me.

Kêmbûna karkerên şareza aboriyê lawaz dike û dibe sedema bilindbûna bihayan. Ji ber vê yekê em dixwazin bazara navxweyî ya Ewropayê ji bo kar, enerjî, sermaye û karûbarên dîjîtal bêtir berfireh bikin.

# Têne kar her derê.

Divê hemû derî ji kesên bi motîf re vekirî bin. Kesê ku dixwaze li welatekî din bixebite, divê karibe bi hêsanî dest bi karê xwe yê nû bike. Kesê ku dixwaze wekî kardêr hemwelatiyên welatekî Yekîtiya Ewropayê bide şuxilandin, bila nekeve nava burokrasiyê.

# Parastina Ewropayê bi hev re.

Divê em azadiya xwe biparêzin. Em dê tenê bi hev re di vê de bi ser bikevin. Ji ber vê yekê em dixwazin bi lez û bez Yekîtiya Parastina Ewropayê ava bikin. Em dixwazin vê yekê ber bi artêşeke Ewropayî pêş bixin.

# Şiyana tevgerê di demên kirîzê de.

Divê Ewropa bi lez tevbigere. Lêbelê, hinek ji welatan niha dikarin biryarên girîng di siyaseta derve û ewlehiyê de asteng bikin. Bi rakirina vî mafê vetoyê re em dê şiyana tevgerê ya civaka Ewropayê zêde bikin.

# Ewropaya xweparêz.

Teknolojiyên ku li Ewropayê ji bo parastina parzemîna me hatine pêşve xistin, divê werin xurtkirin. Ji ber vê yekê em dixwazin Fona Parastinê ya Ewropayê û herwiha kirîna çekan ya hevpar berfireh bikin. Ji bo hinardekirina çekan li hemû welatan jî pêdivî bi qaîdeyên yekgirtî heye.



## Parastina avhewayê bi rêya aboriya bazarê.

Em dixwazin avhewaya xwe bi amûrên aboriya bazarê biparêzin: Bazirganiya emîsyon (belavkirin)a Ewropayê bi kêmbûna sînorê gazên gerim (Treibhausgas-Limit) re bandor û karîgeriyê garantî dike. Her wisa em dixwazin teknolojiyên hilanîna CO2 gengaz bikin.

## Îcadkirinê li şûna qedexekirinê.

Pêdiviya me bi dabînkirina enerjiyek ewledar û tevgerek dostane ya avhewa heye. Ji ber vê yekê em xwe dispêrin vebûna ji teknolojiyê û dahêneriya mirovan: Şewata Elektronî (E-Fuels), teknolojiya fuzyonê û nûbûnên din dikarin ji me re bibin alîkar ku em serkêşiya dijwariyên dema xwe bikin.

## Zîrekiya destkird ya li Ewropayê çêkirî (made in Europa).

Em dixwazin di her warî de derfetên ku ji hêla zîrekiya destkirdê ve têne pêşkêşkirin bikar bînin. Ji ber vê yekê em hewceyê qaîdeyên zelal û hêsan in ku nûjeniyê pêşve bibin û di heman demê de parastina mafên medenî misoger bikin. Bi vî rengî em dixwazin Ewropayê ji bo zîrekiya destkirdê bikin Hotspot.



## Şer li dijî enflasyonê.


Ji bo ku em dewlemendiya xwe biparêzin, em berî her tiştî têkoşîna li dijî enflasyonê tercîh dikin. Ji ber vê yekê em bi îstîqrara darayî ya li Yekîtiya Ewropayê ve girêdayî ne. Divê lêçûnên hikûmetê bêdawî zêde nebin. Dê ketina deynên hevpar yên bi welatên din re bi me re nebe.

## Derfetên pêşkeftinê bi rêya perwerdehiyê.

Tenê bi perwerdehiyê dikare derfetên rastîn yên pêşkeftin û karên balkêş derkevin holê. Bi Erasmus+ re em dixwazin perspektîfên nû ji bo ciwanên di pîşeyên perwerdehiya dualî de vekin. Divê azadiya tevgerê ji bo perwerdehiyê bibe azadiya bingehîn ya nû.

## Nîzam û kontrol di koçberiyê de.

Em ji alîgirên realpolîtîkayek nû ne dema ku mijar tê ser koçberiya neqanûnî. Emê koçberiya neqanûnî bi prosedurên penaberiyê yên bileztir li navendên penaberiyê yên li sînorê derve yê Yekîtiya Ewropayê an li welatên sêyemîn kêm bikin. Divê di dema redkirinê de veger bi domdarî were pêkanîn.



# 5 sedeman ji bo hilbijartina FDP:

**1. Dengek ji bo dewlemendiya bêtir**
Em dixwazin bazara navxweyî kûrtir bikin, aboriya bazara civakî ya li Ewropayê xurt bikin û bi hevkarên xwe re peymanên bazirganiya azad pêk bînin.

**2. Dengek ji bo ewlehiya bêtir**
Em dixwazin kapasîteya berevaniyê ya Ewropayê zêde bikin, kirîna çekan berfireh bikin û biryarên di siyaseta hevpar ya derve û ewlehiyê ya Yekîtiya Ewropayê de bilezînin.

**3. Dengek ji bo bêtir derfetên perwerdehî û pêşkeftinê**
Em dixwazin sûdwergirtina ji teklîfên xwendina li derveyî welat, derfetên li seranserê Ewropayê di perwerdehiya pîşeyî û teklîfên kar de li Yekîtiya Ewropayê hêsantir bikin.

**4. Dengek ji bo nûbûnek bêtir**
Em dixwazin ku Ewropa bibe şampiyonek nûjeniyê - bi vebûna teknolojiyê li şûna qedexeyan û şert û mercên baştir ji bo veberhênan û destpêkên taybet.

**5. Dengek ji bo kêmkirina zêdetir di burokrasiyê de**
Em dixwazin aborî û gelên li Ewropayê ji burokrasiya felcî rizgar bikin û bi vî awayî ji bo mezinbûn û pêşkeftinê hêzek nû peyda bikin.



**Di 9'ê Hezîranê de FDP**

Weşanger:
Partiya Azad a Demokratîk (FDP)
Reinhardtstraße 14
10117 Berlin
Telefon: +49 (0)30 284958-0
E-Mail: info@fdp.de

@FDP, @strackzimmermann
@fdp, @MAStrackZi
@strackzimmermann
@FDP, @mastrackzimmermann